Abbas ISM'ÎL

# XELATA MANDÊLA

HELBEST

1999

**Abbas ISMA'ÎL**

# *XELATA MANDÊLA*

Helbest

1999

# DIYARÎ

*Ji ber ku çend helbestên şoreşgêrî zimantûj rexnegir û rastgo di vê pertûkê de hene, min xwest ez wê diyarî qehremanekî bikim, ku bi mêranî û raste-rasta berevanî di ber gelê Kurd de kiribe. Vêca min dît ku serokê payedar û hêja berêz Mandêla hemkûfe bo ez jê re diyarî bikim, digel maç û silavên germ.*

**Abbas ISMA'ÎL**

# PÊŞGOTIN

Ev gurzê helbestên di nav destande, bi comerdî hatiye hûnandin, ji kezîyên zer, ên keçên Helebçe, û ji şivik û pelên kesk, ên darê zeytûnên herêma çiyayê kurda, û ji rengê xwîna zarokên sînema Amûdê. Bê goman, ev gurzê kesk û sor û zer, pêwîste ku ji yekî weke (Mendêla) re bê pêşkêşkirin, çimkî dema ku ji vî qehremanî dipirsin:

- Gelo çima te xelata Etaturk bi xweve nekir?

Bersiv ev bû:

- Kesê bixwazê zanibê çima, divê duhmekê xwe têxê şûna mirovê kurd de, wî çaxî wê bersiv xweş têkevê ber çavande.

Di derheqa vî kesê birûmet û hêja de, hozanvanê Me abbas dibêjê:

*Banga dilan*
*belsema derd û kulan*
*hêviya bêhêzan*

*awira çavên bindestan*
*fenera mişext û mafxwestan*
*kenê çavên bêkesan*
*Mandêla ...*

Ji ber vî hawî, û ji ber vê piştdariya giranbiha, pirsek ji nav pirsan, di hişê min de dixijmijê, û dibê ma duriste em tim û tim bêjin: "Hewara Kurd herdem çiyane"?.

Ev ji alîkî ve, ji aliyê dî ve jî ev gurze helbestan xweş didê diyarkirin ku agirê evînîyê, di dilande navemirê, ji ber jiyana bê evîn, jiyaneke pûç û xave, loma yekî temenê wî 60sal, mîna mamosta (Ebas), çaxê ku di çileyê 1998an de, ji Efrînê diçê Raco û pêrgî keçek kurd dibê, dilê wî di lingê lingde û bi xurtayî lêdixê, nemaze dema ku ew şepala bejin zirav û rind, li kêlekê siwardibê, loma dibêje:

*Devê min şikest, ez mame bêzar*
*şewq û bîna wê, xistim taya sar*
*dilê min neçar, bûye mest û har*
*bi zarek şêrîn, bi dengekî lar*

*Xwestî ku rûne , li nik dilê jar*

Di dawî de, ez karim bêjim ku kesekî di vî temenî de, rajê pênûsê û bi zimanê bav û kalan, çîrok û helbestan birêsê û pêkenînka bicivînê, û derd û birînê gelê perîşan dermankê, bê goman, kesekî bi vî rengî, evîndarê doza gelê xwe ye. Ji lewra kula peymana Cezair 1975an, berçav dike, û ev bixwejî mizgînîkê ji mere pêşkêş dikê û dibê: doz winda nabê, madem dozdar hene.

**Elyê CIZÎRÎ**

# PÊŞGOTINA MIN

Bi rastî gelî heval û hogiran ez ne helbestvanim, lê di baweriya min de her kes di jiyanê de xwedî hest û raman e, çi nimz û çi bilind, çi germ û çi sar, çi weke lehiya sor, çi weke cobarekî teng û tenik be, her kes bi dîtina govendê şadibe, û bi dengê giriyê di şînê de madtirş dibe, her kesê bide dûv termê ciwanekî wê histiran bibarîne, her kesê dîmena zarokên sînema Amûdê û Helebçe yên kuştî û beşifandî bibîne, yan li stiranên Şivan guhdarî bike, wê mejiyê wî birele, wê hişê wî bête guvaştin, wê hêrz xwe berdin damarên xwîna wî, wê eniya wî xwêdan bide.

Bo vê yekê dibe û ne qedexe ye ku mirov carekê yan carina helbestan binivîse, li gorî beza hespê raman û xewnên xwe, li gorî kela hestên xwe mirov wê helbestê dirêse.

Min jî weke xortekî xwendevan û xwînagirî, di ciwaniya xwe de helbestên evînî û şoreşgêrî bi zimanê Erebî dinivîsandin, lê piştî min qûnaxên xortaniyê bûrandin, kar û barên siyasî û abûrî hest û ramanên min dîlkirin ez demek dirêj dûrî armanca xwe çûm, lê her û her ez bendewarê yara xwe bûm, ya ku evîna wê xwe di dilê min de veşartibû ta sala 1982, di wê salê de yara min serê xwe rakir, xemil û xêza xwe li xwe kir, bilez xwe berda nav bax û bistanên gul û kulîlka, birastî ez dibêjim heval û hogiran jî bi germî yara min pîroz û xelat kirin.

Dibe tekoşina min ya toreyî dereng dest pêkir lê ez xwe di vê biwarê de ciwan dibînim, bi hêz dibînim, ji ber ku çaxa filoklor dicivînim yan çîrokekê dinivîsim yan helbestekê dirêsim, ez salan najmêrim û porê serê xwe reş dibînim.

Di vê pertûkê de min çend helbestên çîrokî nivîsîne wek-Hemik-Kerê qehreman-Evindarî li Efrînê- ez

dixwazim heval bixwînin û rexna lê bigirin.

Li dawî ez supasîya her kesi dikim yê ku nav di min da û dilxwazê Pêşxistina min bû.

# HEMIK

Hebû xortek pir ciwan
swarê hespa rehwan
zend û bendên wî qelew
dilhesin û qehreman
pesindar û binav hildan
mêrxas û hem pehlewan
bi roj çeleng û mervan
şevên tarî nijdevan

karê wî qedexe bû
her şev şer û qewxe bû
tûtin tanî ji Xursê
leşker dixistin tirsê
ew leşkerê pir xizan
bi çeqmaq û bi xurman
jê re dibûn dergevan
ewî digot : Bê guman
rojên qewamên giran
ezim leheng û egîd
ez xwe nadim bi Seîd
ne bi Osman û bi Çeçan
sed mixabin û ahîn

gava Turko dav danîn
şikandin desthilanîn
dima hêviya rêberan
ta jê , re vekin buhiran
bumba ji riyê rakin
dil ji sawê rihakin .

Şevek stêr tev mirî
heyv razayî temirî
rojê bixwe :
kir gazin û kizkizî
xwişka şevê :
te nîv danek min dizî .

Teymen hat ji Nisêbînê
kemîn xist ser kemînê
besta Zixur kir tabûr
leşker çandin gir û hûr
ger karwanê Hemik hat
jê re tune be felat
yê wî bigre bi destan
mehek jê re vehistan .

Leşkerê birçî û melûl

di kozikê de melisîn
serî danîn pirnisîn
teqnek çû şev bûye zîz
bayê kur kir vîze vîz
bû fire fira hespan
ji dûr ve tên bar giran
paşmêr bangkir rêberan
pêjnek heye ne tirsin
du ling li pêş yek li paş
hûnê derbaskin hesin

Teqî tivinga pêşî
bû xurîn û gengeşî
leşker serî dakirin
lûle bi jorve kirin
ew berdidin bê nîşan
kes xwe nake pakrewan

Hemik bangkire Teyman
nav di xwe da jê re got
vaye qada mêrkujan
ezim şêrê Talatê
ezim berxê ber beran
te digot : Ez leheng im

serî rake ji nav lingan
were bikev singa min
eve ezmûna mêran
wê bixuye bê guman
bê kî berxe .. kî beran
eve şeva bi nav nîşan
yan jiyane yan neman

Bi teqîn û navtêdan
sînor derbaskir karwan

Hemik paşpê daket jêr
rêçik berda ne bixêr
bû gumîn û bû hewar
xefik peqî bû hezar
xwelî û toz û dûman
bûne ewrek pir giran
şev reşkirin bû qetran
teymen bi xwe de berda bû
lê piştî bumbe peqî
xwîn ketî damarên wî
rabû ji kozikê riha bû
xwe paqijkir bixwe şa bû

Hemik kanî çi bi te hat
rabe bike kêferat
li te nebe rojhilat
toz û dûman çûn asman
kevir û kûç li qadê man
Hemik çavê xwe vekir
wî dît lê bawer nekir
jê weye sed perçe ye
tilî perçê gewre ye
xwe peland tev xurcilî
lingê çepê xilxilî
rehek tenê jê maye
ji Hemik re belaye
wî ne kêr û ne xincer
berik nabe bête der
Hemik livî wek piling
berek danî li ser ling
xwe kişand ta reh qetî
agir bi dilê wî ketî
hinava wî şewitî
pişt vekir ling girêda
pê ji dijmin re nehişt
ew jî bi mil ve berda
bi dûpişkî bi qûnkişîn ê

derbaskir şiva tirênê
heval tev bendewarin
li binxetê tare-mar in
wê çibikin nikarin

Leşkerê Sûrî hatin
guhnedan barê qantira
li rewşa Hemik nêrîn
jê re bûn bav û bira
anîn mexfera Dodan
li ser textê xwe radan
têlegraf dan Qamişlo
makîne hat yek û do
Hemik çû nexweşxanê
pê xistin goristanê

Pir vê çîrokê zanin
lê nexwende û nezanin
kî vê çîrokê bêje
wê bêjin mest û gêje
Hemik bixwe zindî ye
ew sax e ne miriye
li Swêdê beliye
pirin wisa qehreman

tenê li nav me Kurdan
lê mixabin û eman
em mane li bin destan
bê dewlet û bê keyan .

## *FERHENGOK*

*Seîd : Seîdê Xursiye, yê ku turko xistibûn qaqa reş, her çend şevan karwanê wî yê qaçaxê sînorê Turko û Sûrî bi zorê û şer derbas dikir.*
*Û wisa jî cîwanmêr Osmanê Gewrê û Çeçanê Reşwanî .*

# XELATA MANDÊLA

Banga dilan
belsema derd û kulan
hêviya bêhêzan
awira çavên bindestan
fenera mişext û maf xwestan
kenê çavên bêkesan
rivîna azadiyê
gurr û bilind her gav û dan
Mandêla
kirasê xizan û taziyan
gepa merdal û birçiyan
rondika berdîwar û sêwiyan
Mandêla
gelo kî ye ? ji ku hatî ye ?
peyambere yan nebî-ye
Mûsa ye ew ?
yan Isa yê behrewî ye
bo miriyan jîndarî ye
eger dê be ew zayî ye
sed eferîn
bo wê diya ew anî ye
bo me kurdan bû berevan

bû dadeyar bû xwedî ye
ji ku hatî ?
ji ku derketî ?
ji kanî û solavên Hemrîn û Sîpan
ji hinava Cûdî diya kesan derketiye
yan dêwên Hoto û Şanîdar
yan Ehrîman ew aniye ?
yan bahoza pêlên deryan
ew danîne li ser milan
ji başûrê tev kul û jan
diyarî kirin
bo me kurdan ?

Mandêla
te firotin kinc û nîşan
ne xizanî û nabî xizan
xelata Turko te ne girtî
tiwî leheng û qehreman
te dersek da van serokan
reş û spî rast û çepan
serî danîn
te li wan kir barek giran
bi şahbazî kete rêza
wî Beşikçî û Mîteran

wek Qezafî
weke Baba yê mihrevan
bû dozeyar bû lavekar
bo me kurdan

Mandêla
çi hêja ye bikim xelat
ji te re bînim
giranbuba bi pejirînim
ezê rabim bilezînim
komîtekê li darxînim
berêz Baba jî Roma bînim
Leyla zana û Beşikçî
bi kotekî ji zindanê wan derînim
Xandî û Cewahirî ji tamarê wan vejînim
li Amedê li şanişînê bicivînim
masa Melek Ehmedê Merwanî
li ber wan dînim
gurzek kulîlk bi hevgihînim
ji derdora goristana
Qadî û Berzanî û Şêx Seîd
bicivînim
ji herêma Helepçe û Xormal
ji nav deviyan û diriyan

çend keziyên gulî soran veçirînim
çend şaxên zeytûna ji Efrînê bînim
taca Mîtanî bi nexşînim
eve xelata Kurdan
li ber komîtê dînim
eger gotin ev hindike
ezê herim dergehê xizna Kerkûkê
û Kerminşahê û Batmanê vekim
kilîta wan bişikînim
kinc û cilên Mandêla vegerînim
qîzekê ji Deşta Mûşê
yan Şehrezûrê bixemlînim
Mem û Zînê
Siyamend û Xecê
Ferhad û Şêrîn
bikim xêlî bi dor xînim
Xanê çeng zêrîn û koma peyan
bikim pêwan û zêrevan
bi karwanê bûkê re bişînim
ez dimînim bi kul û derdim... tev
birînim
ezê derkevim ser kopê Cûdî
vî karwanî bişopînim
bi dengê bilûra şivanên Serheda

bi zûrîna gurêd zozik
bi awazê stranvanên Reha yê
sê dengan ji bûka Mandêla re
bilîlînim .

## Ji Rûpelên Kevnar

Kurd dibêjin : Çaxa Cihû xizan dibin li defterên kevn vedigerin .
Min bixwe berî çend rojan tûrikên xwe yên kevn pelandin min çend helbestên xwe yên bi zimanê Erebî dîtin, rabû min ev helbest helbijart û wergerand zimanê bav û dê, ev helbest di pêncê meha çaran sala 1975 hati ye nivîsandin, piştî muhrkirina peymana Cezair bi çend rojan.

## SÊWIYA MIN

Sêwiya min
sêwîtî bixwe ji te bikîne..!
naxwaze navê xwe li te bike
û te bibîne
lê weke her kesê sêwî
giriyê min bi rewşa te têt
çawa navê te heye ?
û tu bê navî

çima tu çêbû ye ?
kê tu çêkirî ye ?
ha... ha xuyaye raste
Ehrîmen tû afirandiye
ji lewma yezdan û xelqên xwe
hemû dijî te ne
sêwiya melayînên ji hev ketî
tu weke kelekek bê xwedî ye
bê kelekvan e
baskên te weşandî ne
di gola stirî û diriyan de
digere û nizane berî li ku ye
baskên te perpitî ne
tu nema karî xwe bigihînî dadgehê
diyare tu nizanî dad û dadyar herdû mirine?
xuyaye te bi tenê nebihîstiye
dad li Tehranê binax bû
dadyar li çiyayê Oras xwe kuşt
paşê ew li Waşintin veşartin
sêwiya min .. na û sed na
sêwiya pêxemberan û mîrê cina
ew jî bikêr te nehatin
ew jî hatin serjêkirin

Ereb û Turkan dil û ciger xwarin
Marks û Lînîn mejî birin
hestî bûne para te
ew jî sotin
bi tirafê bi ariyê
tu kor kirin.
sêwiya min
dawî ez xwedî me
da were em bi hev re bigrîn
hîn çend dilopên histiran
di çavên min de diçirisin
ez naxwazim bê sûde
zuha bibin .

# KERÊ QEHREMAN

Hebû tune bû
rehme li dê û bavê me û guhdarên me bû,
bilî dereka û cendirman ...
em dixwin nan û nîskê
ew dixwin goşt û qawirman ..

Kerekî cûn û ciwan hebû
li gundekî ava û gewre bû
li başûrî welatê me bû
ker zîrek û zane bû
û pir li xwe ewle bû
têr êm bû aza bû
karê wî pir tune bû
serberdayî
bê hevsar û rişme bû,
geh dihat axurê xwe
geh li ser bêderan
lotik didan gevze bû

Xwediyekî wî hebû
bê sinc û bê tore bû

reşik bû , por xelek bû
pêxwas û bê ole bû
rewşa kerê qehreman
bi wî re bê wate bû
bi sqêf û bi dara
ew di ajot bin bara
kê ker ji wî bixwesta
ewî nedigirt ji desta
nema li ker bû xwedî
hindik mabû wî berdî .

Rojek ji rojê xewedê
xara kera ket qadê
bi tîza bi lotika
bi bez û bi çindika
kerê cûn pir westiya
mejiyê wî çelqiya
ji tîna ji birçîna
wî guhneda birîna
kete ser çewalê ceh
delavê xwe kire deh
derbas bû gova berxan
çendik kuştin bi zîtan
xwedî hate ker bi dar

kerê qe jê danexwar
pişta xwe da xweyê xwe
derxist kîna dilê xwe
pênek avêt eniyê
ew zîzkir wek teşiyê
xwîn herikî bilehiyê
qîr û hewar û gazî
çi bûye çi daxwazî
wî hogiçê qehreman
xwedî kuştî bê guman

Lê civiyan kesên gund
li dora term bûne kund
ta ku hatin aqilmend
zanyarên bi hiş û pend
wê çi bikin ? çi bêjin ?
mitale ne bê pêjin
nema zanin çi biryar
guh û terî bûn mijar
guh jêbû , terî birîn
gund berda bê vegerîn

Ker terqiya çol û çol
histir û xwîn bûne gol

berê xwe da çayê jor
ew nizane ka sînor
leşker çiye ? kî himber ?
ew nizane kî çawîşe kî nefer ?
serxet çiye ? binxet çiye ?
rast berî da bekçî ye

Burand dava mirinê
nû zeryê daye dinê
ker biyan bû
bê pasport
xwe dîtî li rexê dinê
ji kêfa kire zirîn
ji tirsa berik peqîn
yê kozikê lot neda
rehên dilê wî qetîn
çaxa textor lê neriye
ji wan re got rastîye
ev deh sal ew miriye
sawa kerê qehreman
ciger pêv nehiştiye

Kerê rêzan ne westiya
bi lez û bez xwe winda kir

kete nav dar û deviya
li wê texmê baş geriya
warê wî bû şikeft û çiya
deng û basên bûyerê
belav bûn li deverê
hinan gotin
ev kerê han dojehî ye ?
hinan digot : bihiştî ye ?
hinan digot:Li zindana Darê veşartiye
hinan digot:Ew li şikefta Gurguriye
kerê kujyar xwîniye
ew bê kes û bê xwediye
kesek ji deverê nizane
yan saxe yan miriye

Şêxek li wê navçê heye
bê şaşik û cibe ye
pir dilsoz û dilkovane
bi her tiştî ew dizane
bi saya cin û polikan
raze tev jê xuyane
kî dize kî winda ne ?
ber çavê wî xweş beyan e
hin baweriyên wî hene

ji yê her kesî cude ne
geh Şêxe geh Mele ye
geh Pîre geh Keşe ye
bi her zimanî fehlewan
ta yê çûk û lawiran

nûçeyên vî kerê mêr
ketin guhê mê û nêr
her kesî xwest bibîne
bo sawa xwe hilîne
lê şêx Şakir bi saya mîr
ker tapkir anî ber nîr
ker bilez anî malê
ji xanima xwe re got :
Eve ê ku bikêr me hat
eve dostê min ê rast
ava riwê min alast

ew şûştin derman kirin
niviştok pêvekirin
bi delalê rakirin
kes nizane bo çiye ?
bilî yekî pirr zana û xwende ye
ew jî li ters bajêre

li wê navçê navdêre
navê bajêr Stilîle
bi gulzar û kaniye
bi bexçe û deviye
nav dar û spindaran
çivîkan lîle lîle
xalê Mûsa li deverê
zanyar û bê temtêle
li deverê bi nav û denge
wek keleha heft renge
wî jî weke şêx Şakir
zanibû ker çi rakir
çaxa ku çîrok bihîst
derdê mezin di xwînê de
geh lebitî û geh lîst
Mûsa rabû bi giranî
pênûs kişand ... pel anî
bi histrên tev li xwîn
name nivîsî va bixwîn

Şêxê min yê birûmet
pirr bilind û bi qîmet
wî şêrî qehremanî
ji me re bişîn mêvanî

emê jê re pêşkêşkin
rêsiyên deşta banî
tev Nefel û Endeko
pê re şoqilê xatûnî
emê gewdê wî bişon
bi sabûna Rehanî
qenciya wî li me heye
ji me re nabe kêmanî
çimkî ewî lehengî
tola bavê me hilanî

bersiva Şêx Şakir ji Amê Mûsa re eve:
kekê Mûsa tu hêja û mezin e
her tiştê me li ber te ye
zarok û mal û jin e
ji te pêve kes tune
bo çîrokê dipojin e
gotinên te tev rastin
bo dîtina vî kerî
mafê te wek yê min e
lê şandina vî şêrî
mercên me bi te re hene

1-Dora stilîlê baxce ne
hin jî ceh û kizin e
ker dagere zeviya kê
divê ew neke pin pin e
2- Çaxa ku ker bikeve xew ,
gul û beybûna bixin bin e
3- Kerê min li yê kê swar be
nabe ew bike gazine ? .

*Qamişlo 1985*

## *EVÎNDARÎ LI EFRÎNÊ*

### Nerîna min di biwara helbestê de

*-Pesnê serok û fermandaran helwiste.*
*-Pesnê şeran û şînê darbeste .*
*-Pesnê evîndariyê û xuristê helbeste.*

Di çilê sala 1998 an de ez çûme Efrînê, min xwest ez hevalekî xwe bibînim, ji min re gotin: Ev kes mala wî li Raco ye, rabû ez swar bûm, ez çûm Raco, bi rastî bûyerên vê çîrokê bi kurtî hatin hevdudan, û min berfîreh kirin, û min li gorî temenê xwe, yê ku bûbû 60 şêst sal di vê demê de, ev helbest nivîsand.

*Heleb-27-3-1998*

# EVÎNDARÎ LI EFRÎNÊ

Çûme Efrînê... bajarê navdar
çiyayên rengîn.. tev çîmen û dar
kaniyên zelal.. çemên weke mar
solav ji jorê... sivik têne xwar
mêwên xemilî... zeytûn û hinar
hemû kesk û zer.. kulîlk û çinar
li vir xewdikin... dîmen û gulzar
razbere cîhan.. bihişte ev war

Çûme bibînim... hevalek sozddar
gelek birûmet... hêja û şiyar
dilkovane ew ... gelek zaneyar
ew jî weke min ... welat dozedar

Ez daketim jêr ... hilkişîme car
kolan û qozîk ... tevî qada şar
min li xwe pêçan .. bê sûde û kar
yekî gote min ... berwar û berwar
here geracê ... tijî otokar

ew li Racoye .. gundekî diyar
li wî gundî ew ... gula bê bihar
gundê xemrevîn ... lûsê bayê sar
cihê wî nala ... textê xwendekar
bûka poz bilind ... zava bendewar
narîne xurist ... dixwînin kenar

Ez ketim foksê... hîn kêm bûn swar
ji dûr ve min dît ... qîzek tê bixar
pir bihêle mêl ... ewe xifş û kar
min lê meyzekir... wek nala her car
qe guh lê nekir ... li xwe nekir bar
ta ku nêzîk bû ... nû min kir hewar
hewara melûl .. bûye tare mar
hewar û gazî ... kêr nekir bi car
min kes tune bû ... zû bîne nijdar
devê min şikest ... ez mame bê zar
şewq û bîna wê .. xistim taya sar
dilê min neçar ... bûye mest û har
dinan lerizîn ... kirin bêne xwar
ji yezddan re ez .. bûme lavekar
bibûrîne min best bike bêtar

bizarek şêrîn ... bi dengekî lar

xwestî ku rûne ... li nik dilê jar
min serî danî ... bê deng û neçar
sendel valaye ... fermo tu hevpar
çend awirên tûj ... bi tîn û dijwar
bişavtim ez mam ... hestî û eyar
hiş û cergên min ... ketin dava yar
bo lêvên arîn ... bûme evîndar
bo dêmên şêrîn ... ez bûme dildar
temenê bûrî ... ji wê re diyar

Çaxa wê pirsî ... rakirin damar
gelo tu kiye .. çitonî hevkar
weke te kurdim ... bê hêz û hejar
ezim dotmamê .. pismamê dil ar
çaxa ku daket ... dilbera nazdar
zîvirî û got ... Heval diçim kar
ew kare berêz ... ew mûm û fenar
bi lêvan kenî ... bi çavan û çar
ez ne kuştim wê ... hiştim birîndar
Xwedê kirî ko ... min dîtî yek car
ji wê rojê de ... ziman bû hezar
eşqa vê jînê ... kirim hesteyar .

## *Şîna Medet Serhad*

Deng û awaz nivisîn
gul û beybûn çilmisin
çûk û tilûr melisîn
deşt û çiya helisîn
şûr û pênûs pirnisîn
kes û perû çirisîn
şîna serhad hishisîn
serhad sitêra her şevan
serhad bû,zarê her ziman
maf û daxwaza kesan
serhad evîna gel û can
çawa şûn maye cîhan..?
bûn wêran qûnax û xan
deng bilî ji bilbilan ?

Dijmin weşandî tirs û jar
hêla Kurdan gund û şar
şêr û bazên me,bi hezar
dane kuştin hatine xwar
bûne talan pez û dar
her bi qîrîn her hewar
kanî mûsa kanî serhad dadeyar.?

*Xalek:*
*Ev helbest min nivîsand çawa min bihîst ku xortek avokat li Istenbolê hate kuştin, rabû min ji cînarê xwe pirsî yê ku xwendina xwe li wir kuta kiriye ewî ji min re got: Du xort weke Memed Serhad di kurdan de peyda nabin, ciwan mêr wisa pesnê wî da û min jî ev helbest nivîsî.*

# SÎNEMA AMÛDÊ

## PÊŞGOTIN :

*Me di helbestê de gotiye ku,bajarê Amûdê du caran hatiye sotin, cara yekemîn çaxa Seîd axayê Deqorî-Bavê Mihemed-di sala 1937 an de raperînek himber dagirkerê Firensawî rakir, rabû artêşa Firensawî bajarê Amûdê bombebaran kir.*

*Cara duwem, çaxa berpirsiyarên dibistanan şagirt handêr kirin bo alîkariya şoreşa Cezair, ku bilêtên sînema bikirin,*

*û di roja duşembê 13-11-1960 de dora sêsed şagirtên rêza penc û şeşan hepişandin Sînema teng û tarî, û piştî demek kurt sînema şewitî, bi ser serê wan zarokên reben de herifî, xortê qehreman Mihemedê pakrewan çendek derxistin ji mirinê riha kirin, lê dawî ew jî hate sotin bi dilovaniya Xwedê şabû,*

*Di encamê de nêzî 200 dused mendalên kurdan hatin kuştin û gelek birîndar bûn û gelek ta îro şehtin.*

*Di wê demê de, û piştî vê bêtara mezin, min ev helbesta wêbê, bi zimanê Erebî nivîsî, bû, û anuha min wergerand zimanê bav û kalan, digel hinek guhertin û pêlîstin, di vê biwarê de, û bi goya vê seberatê ez vê helbestê diyarî mendalên Helebçe, û Keledize, û Alaqemşê dikim.*

## SÎNEMA MALWÊRAN

Payizek hov
zerkir zemîn
şevek zikdir
bi rik û kîn
ewr û dûmanê
weke swaran
pêşbazî kirin
dijî hev bezîn
nûçên mirinê

weke dêlguran
bi dilşewatî
gurkirin zûrîn
rivîna ilor
belavkirî tîn
tîna tevî jan
hilma wê bi bîn

Laşêd mendalan
ter û nazenîn
di wan de derbûn
sed û yek birîn
kelax bi koman
reş bûn şewitîn
dîmena kirêt
kes û cinawer
kirin mest û dîn
qirik lal bûbûn
hinav dikelîn
nav û slogan
tevî qurqiçîn
nemendî bûbûn
ew bang û bijîn
kanî Cemîla

kanî Binbila
kanî Cezair
hewar pir dûr e
rê hatin birîn

Dîwar hatin xwar
ban jî herifîn
esîmanên jor
hemû digirîn
barandin ewan
histirên bixwîn
li her deverê
ahîn û nalîn
li her kolanê
fîxan difirîn
li her qad û malê
li darxistin şîn
her kes li ger bû
bi lez û bezîn
ev çi hişmate
çi deng û qêrîn
ka jin li ku ye ?
bav ka li ku ye ?
hemû bê hiş bûn

û xwas dibezîn
hinekan digot
Cîhan lerizî
peqî ye gerdûn

Serqot û şaş bûn
her şêx û mela
kum û şaşik li
wan bûne bela
şal û cibên wan
li wan herbilîn
lava û tika
ji bonî xwedan
binêr û bibîn
Cibrîl bişîne
agir vemirîn
vî bajarê ham
wî çi kiriye ?
timî cerg bi xwîn
timî dilbirîn
ev du care ew
şewatê dibîn
lê naşike ew
serî natewîn

rizgar parêze
wê herdem bimîn
wê herdem bimîn .

## *BA VÊ YEŞAR*

Weşokanî enya cîhan
warê bapîr û mêjevan
jîna kevnar
waşokanî ji xew rabe
dergeh veke
va hat Swar
rake ji xew
xort û keçan
tev çem û dar
bike qîrin ,
bicivîne
her dost û yar
bikin girî
reş girêdin
bikin hewar
amad bikin
bexçê gulan
rengîn bihar
vexewînin
tev bilbilan
cûrên kenar
swar dênin

bi delalî
ser textê şar
xilmaş e ew
di xew de ye
nekin şiyar
werin sitî
werin zerî
bê xeml û çar
jêr bistirên
li ser bêjin
bê deng û zar
werin mela
werin Keşa
werin Qewar
werin Milan
ji her Êlan
bi sed hezar
mîr bibînin
ser bixwînin
pêxin fenar
destan vekin
lava bikin
bo dadeyar
Zara kanî

kanî Îsa
yê bendewar
dakev bilez
şiyar bike
bavê Yeşar
ger ranebe
ji wê xewa
dîl û temar
fîxan bidin
Cibrîl melek
ta bête xwar
bi jor xîne
canê şêrîn
dilê hejar
lavekar im
dozedar im
lêvêd bi ken
ne veşêrin
bin axa sar .

# WELAT EVÎNE

Çawa dibêjî evînî hilat
dilê me bûye
tenûra vala , kewara kula
cerg û canê me
bûne mest û mat
raman şev û roj
pevçûn û qewxe ,
şer û kêferat
geşî û şahî
bûne reş xwelî
ken û girnijîn
li me çûne gilî
bi hewar û zît ,
giriyê bê tebat
hiz û hestên rast
sinc û peyvên nerm
bûne kevin mijar ,
bûne kuç û lat
çima nabêjî
cîhan bihişte
golgek rengîne
li nav piya ye

li ber desta ye
derya evînê
her kat û kêlîk
li ber çava ye
jiyana îro dîlan û sema
geşt û seyrane
xurista xemlîn
jê re hêlan e
çima nabêjî
tariya olê , tu korkiriya
stem û zorê tu dîlkiriye
tu ne aza ye
bask şikestiye
li vê heyînê tu bê evînî
te nîne welat .

# *DONDÊN KALA*

Ey kevza dîrokê
te çavên kaniyên me kor kirin
em xizan kirin
em şelandin
ey ronahiya zara
te em sotin
heyva me tox kir
em di reşê de qoçandin
histirên qîrê ji çavê
kîwana me barandin
dîxuye zikmakên diyan
bûne kadîn
heyvanê jiyana aza
di nêv kaya genî de rijandin
gazinda min ji Cûdî ye
maka heyînê
ewî gelek serî û laş
di şikeft û newalan de
şikandin , perçiqandin
bi hezaran
cerdên giran vegerandin
bi hezaran

leheng û mêr daqurtandin
sed mixbin û hewar
ewî bixwe em xapandin
di nav xewn û raza
em razandin

Gazinda min
ji gola wanê ye
ji hezar kanî ye
miletê me herdem tî ye
em çi bikin ?
wan tu caran
tîna dilê wî neşikandin

Ne eferîn
bo te şingal
keleka rewrewkan
dijmin kelekvan revandin

Ne eferîn
şikefta Hoto û Şanîdar
Nebî hûrî û Xweşkanî
bi hezaran sal û zeman
we bişaftin we rûxandin

eve dana buhagiran ?
bê dudilî
we pejirandin
bo vî gelê bext qerimî
dev qefilî
we jê r şandin
eve diyarî û xelat
carek tenê ramanên gel
ne pijandin , ne hejandin
evin serokên nav qube ?
bi hinge ding
evin evin serokên konevan ?
ewê bixwe ew verşandin
ev serokên dûndên kalan
ev serokên weke qîzan
xortê xelkê ew revandin
hin bê destin
bar ketî ne !
hin bê lingin
rawestî ne !
hin bê hêzin
darê zorê
ew li ser zik ramedandin
hin bê çavin

histir hene !
bê girî têne barandin
hinek ji wan
dev girtî ne
ziman tûjin !
bi xinizî guh belandin
hin bê karin
wê çi bikin ?
helez çû ye
bi derewan jîn bûrandin
hin rajêrin
hin destekin
sinc û bawerî ladandin
bê gumane ev ne kurdin
kî bibêje ? kê gotî ye
ev dar û şaxên
tev rizî û kerimî
ne gelê Kurdî ew çandin .

1.10.1998

# TIRSA MIN

Damarên eniya min
zîv û zêr in
ez saw nagirim
ez na tirsim
çermê laşê min
pola ye
tîr û berikên dijmin
gewdê min derbas nakin
ez gewde girs im
hiş û nerîna min zelalin
ez ne şaş im
ez ne çewt im
ez rastgo me
zîvê qurs im

Top û tankên dijmin
min rajêr nakin
min naladînin
ez ne qels im
bilafir û dermanê mirinê
çiya ê min naşkînin
latên min ji qurm de

ranakin
ez na tewim na helisim

Hebûna min
kevîn û nû ye
herdem heme
rûbar û çemên min
xuşe-xuşin
bax û bistanan
her avdidin
na hedinin na vehesin

Sawêr û xewn
min dîl nakin
na lerizim
lê mixabin ez çi bikim
bê saz û deng ez qîrdikim
hest û giyan
her dikelin diheshisin
çavê stiriyên beloq
li çarçewa gundên kavil
pîj û diriyên sincên rezan
ên berebat
ji min dipirsin

gelo çima
bê lawirin
bê şivanın
em bê kesin

Awirên çavê karxezalan
di kon û xêbetan
li ber perê çemêd genî
kum û kolosêd
beg û axa
li ber dergehê mizgeftan
min mest dikin
can û ciger
ji min didizin
min reht dikin diwestînin

Ji dengê Elah û Ekber
ji wî sofiyê çavsor
zikreş û beran
dijmin mejiwê wî
bi nexê pêlava xwe ve girêdaye
lê ew kore ew windaye
ji wî Kurdê wek marê reş
terî jêkirî

jehrê dirijîne bê pîvan
ji wan bi tirsim

ez çi bikim
kurmê dara min Ziyaye
rivîna ilor û beyan
ya Kerkûk û Batman
kîmya û xerdela
Helebçe
kurmê dara min
nekuştin ne sotin
zindî hiştin

Herdu lûlên li ser milan
berî dane dost û biran
xwîn û dûmanê dibarînin
koma Kurdan disotînin
ma ev çiye ?
ji xwe napirsin .

*Qamişlo 1996*

# AMED BÛKA MIN

Amed bûka min
rabe xwe karke
zava hêjaye
çeleng û pake
bi nazî bihûne
gulî û zulfan
şaxên kulîlkan
di ber de rake

biskan tu berdî
ser eniya gewr
xemla merwanî
bigre hawêr dor
ji Dicle derxe
du kemberên zêr
ji Farqîn bîne
yaqût û mermer
serî re deyne
kofya Sasanî
piya re deyne
gorê mûşanî
zenda re deyne

bazinê Botanî
çava re deyne
kilê Subhanî
sazbenda bîne
ji her eywanî
banke Cezîrî
şiyarke Xanî
ser te bibêjin
hawê bûkanî
zavê payedar
tête bi giranî
gernas û mêre
çêlyê şêranî
şûrê wî tazî
tim bê kalanî
di ber piştê de
şilfa Soranî
ser herdû milan
Agrî û Sîpanî
bilez jêr veke
dergehê banî
zava malxo ye
ew ne mêvanî
tune bilî wî

xweyê vî xanî
zava navdare
ew pakrewanî
ewe şêx Seîd
Şêxê pîranî .

*Qamişlo 1973*

# X WENÊN BI BASIK

Refê xewnan dişopînim
bilind dibe ez rêberim
ji ewrên tarî û tal
dibûrînim
ber perê asîmana
wî digihînim
ew nimz dibe
rêvebirim wî dibînim
nav xunc û gulan
ber perê rûbar û golan
di lûsînim
zixt û stiriya disûtînim
xewn û ramanên
tirş û tal ditirsînim
xewnên bihiştî
di quncik û kolanên mejû
di giyanê geş û şad
digerînim
dost û dijmin xewş dibînim
kiryar û bûyeran
ji bîra hişê xwe dertînim
hinan şermezar dikim

hinan dibexşînim
şahî û gewzeya jînê
kul û derdan
tal û şêrîn li hev dibanînim
qencî û xerabiyê
serad dikim
bêjing dikim
werbêj dikim
wekeviyê , dadmendiyê
tew nabînim
hêviyên mezin
bilind dikim
dikim çiya
ji daristana dixemîlnim
hêviyên biçûk
dileyzînim
dixim dergoşê dihejînim
pendeyaran dicivînim
turkê biryara dipelînim
penga rêsê hişmendan
li teraziwê dixînim
ez dinêrim di ramînim
ne kevokim
ne kovî me

ne çeqel im bi xapînim
ez bazekî nikul keskim
per spî me nazenîn im
penc jêkirî
bê birînim .

Qamişlo 1996

# AVDAR Û SALAR

- Avdarê lê rû reşê
  ji me re tim nexweşê
  bo dijmin dêm geşê
- Salar tu pir çelengî
  şêrê binav û dengî
  şerme gazin û dengî ?
- Avdar a kul û girî
  çima ji me ingirî
  ber me digre her derî
- Salar ezim dost û yar
  ezim newroz û bihar
  ne qudoşim serîxwar
- Avdarê bîn mizgînê
  mîdya derî j'nav xwînê
  derman bike birînê
- Ez Avdara rengînim
  berf û baran barînim
  dijminê te bişkînim
  soza xwe bi cî bînim
  mîdya te vegerînim .

*Qamişlo 1975*

# HEVKARÊ QOÇANDÎ

Gerdena xwe vezilîne
çep meyzeke
rast bibîne
himbiz bibe
xwe qij bike
serî hilde
gewde rake
ne qoçîne
xwe berz bike
bibe dijber
rast û ronî
giyanê min
jiyana min bipelîne
çava derxe
wan bike gok
lingan jêke
herdû qîpan
bike çogan
xarxaroka li kolana
li qozîkan bigerîne
eniya xwe
bike neynik
pozê dirêj

bike dûrbîn
çehr û rûçik
bike tavik
bike ronik
werîsê hiş û ramana
bike davik

Lê mixabin bê havilin
tev tep û rîp
qe kêr nakin
tev zixt û xîp
karwanê min
toza Decalan radike
wan zikdiran riswa dike
wan tox dike
dişikîne hûr-hûr dike
dike nanik
gemiya min avraz dibe
çiyayên Cûdî
bilez diçe
pêlan dirûxîne
bê kîn û rik
dara min reh kûre
xwe li quloçê gamaşî

gerandiye
şax bilindin
şîn û geşin
ber girtiye
bihiştîne çiqas xweşin
dermanê evîndara
belsema kesên nexweşin

Kincên min
kevin û nû ne
biyan nexşin
ramanên min bahozin
bê tebatin kêferatin
ew difirin qe nameşin
bilbilin şalûlin
reng zerkeşin
ne qertelin
ne mê kewin
ne penc bixwîn û zikreşin .

*Qamişlo 1996*

# PEYMANA SÎPAN Û ZAKURD

Sîpan bilind e
swarê ewra ne
rojê di bin re
tîrêj berdane
li jor dibare
berfa giran e
li ber piyên wî
gola kula ne

Sîpan tu bavî
û hem şivan e
Siyamend û Xecê
hatin mêvan e
Xelat û Wanê
dane pey wan e
kovî û devyan
serî hildan e
hemû bûne rêz
bûne karwan e
gelo çi dixwazin

çi derdê wan e ?
Sîpan qîr bide
tevya cîhan e
Sîpan bik gazî
li Zakurdan e
bihev re dênin
soz û peyman e
berfê barînin
navxin baran e
rakin lehya sor
rakin tofan e
nav xwe bavêjin
bend û têlan e
hûn me azakin
ji bin destan e
hewara Kurdan herdem çiya ne .

*Qamişlo 1976*

# *KEVOKA MIN*

Dilkurmî ne bê mehderin
hinav tarî mejûkerin
dav danîne ravegerin
tîrên çava dor û derin
bendên bilind tim himberin

Kevoka min dîl kirine
per birîne
bask xilîne
çeng bixwînin
tew nafirin

Kevoka min dişopînin
kopê çiya
daristana
nav kavilan digerînin
daxwaz ewe bifirînin
biyan dûra biterqînin
jê ditirsin
na lûsînin

Kevoka min perwaz bide

hilperike ew dibînin
kanya kînê
ji dil dertînin
bê hêz dikin
diwestînin di melisînin
na bexşînin

Kevoka min xwedan heye
bê xwedî ye
kî xwedî ye
bê giyan e û sofî ye
xewnên winda ew radane
dil miriye çav rijî ye
yezdan dûre nayê hane
dijmin vaye
ew birayê misilman e
ne oldare
stemkare
bê sînor û
bê pîvan e

çiya heye
bê derî ye
wê çem hene

bê lehî ye
xwedan deşte
bê şivan e
bê kerî ye
xwedan reze
bê xwedî ye

Kevoka min
baz şiyarke
dem bûrî ye
vê heyamê
kar gereke
xewa şêrîn
besî wî ye .

*Qamişlo 1985*

NAVEROK


| | | |
|---|---|---|
| *1* | Diyarî ...................................... | 3 |
| *2* | Pêşgotin.................................. | 4 |
| *3* | Pêşgotina min......................... | 7 |
| *4* | Hemîk...................................... | 10 |
| *5* | Xelata Mandêla....................... | 17 |
| *6* | Ji rûpelên kevnar .................. | 22 |
| *7* | Kerê Qehreman....................... | 25 |
| *8* | Evindarî li Efrînê.................. | 34 |
| *9* | Şîna Medet Serhad................ | 38 |
| *10* | Sînema Amûdê....................... | 40 |
| *11* | Bavê Yeşar.............................. | 46 |
| *12* | Welat evîn e........................... | 49 |
| *13* | Dûndên kala........................... | 51 |
| *14* | Tirsa min................................ | 55 |
| *15* | Amed bûka min...................... | 59 |
| *16* | Xewnên bi bask...................... | 62 |
| *17* | Avdar û Salar......................... | 65 |
| *18* | Hevkarê qoçandî.................... | 66 |
| *19* | Peymana Sîpan û Zakurd........ | 69 |
| *20* | Kevoka min .......................... | 71 |

**Nerîna min di biwara helbestê De**

***Pesnê serok û fermandaran helwiste.***

***Pesnê şeran û şînê darbeste .***

***Pesnê evîndariyê û xuristê helbeste.***

***A. ISMA'ÎL***